

# agahdarî

Weşana mehane ya Enstituya Kurdî li Brukselê

Nr. 5

## Dabas LI SER DÎROKÊ

Dîrok, bi kurtî nasnameya mirovaniyê ye. Neynika reş û spîtiyê ye. Tiştek heye ku qet nayê ziman û bextreşıya mirovaniyê jî di vir de hilandî ye. Dîrokzan teva ketina ber hêzkêsiya dîrokê ya manyatîkî de, tu caran jî li rastiya xwe xwedî derneketine. Bê goman, nivîsandın mîrxasiya gotin û galgalê ye. Naskirina vê Cîhana hevsar qetiyayî, qeydûmerbet şikandî ku hew dizanê berê wê li kuderê ye û bi kuderê de dibeze xwedî derneketine, gîhiştina gerdûnî û serfiraziya mirovaniyê di rûpelên bi xwînê hatine şîstîn û mîrên ku destêن xwe her û her di nava xwînê de sorgeverî kirine bi maşoqiyeq neqam berhimbêz kirine. Kesî bala xwe nedaye ser rengê estetîkî ku sêgoşeyî (sêmili) têne nas kirin. Lewra jî dîroka rûreşiyê her li pêş e. Ji ber ku kesên rûreş serdar bûn û xwedî pêñûs jî bê xîret bûn. Ji dêla ku Diyojen bidine pêş, Skender da ne pêş... hwd. Rewşa me Kurdish hê kambaxtir û encama me nivîskarêñ Kurdish hê bê siluktir e. Heger dîrok, demjiyana niha û hinekî jiyana komelayetî û çavdariya kesayetî be, bê gotin, pêwistiya kalemşorêñ Kurd û xwedî derketina li dîroka xwe derdikevê meydanê. Mixabin ev xwedî derketin heya iro li bêndeyî kesên biyanî ma ye. Gelc, hê jî wê wilo bidomîne? Kengî û ji teref kê ve wê rastiya komên xelkê Kurd bête nivîsandin? Kûçek, latek, berzehek, deviyek, darek nemaye ku li ber mirovekî Kurd nehatiye kuştin. Qirkirin, talanî, wêranî û koçberî bû ye qedera gelê Kurd. Cîhanê teva ev serpêhatiyêñ xwe nivîsandine, em Kurd ketine nava zikreşıya kursî û bexîliya politîkî de. Kalemşoran karbendiya xwe ya bingehîn berdane û ketine nava milkuliyêñ rojane de, sêsexmeyêñ darvekirin û keyandinê ranekirine şipê. Pirranya caran zilm û zordarî ne bes ji teref neyarar ve tê kirin. Dive ku em, êdî kumê xwe datînin ber kaba xwe û mîjiyê xwe li ser vê çendê mijûl bikin.

Medenî FERHO

## SEMÎNERA MUSTAFA DÜZGÜN YA LI SER DÎROKA NÊZIWEXT Û DÊRSIMÊ BALKÊŞ BÛ

Bi berdewama programa Enstituyê ya salane ku daye ber himbêza xwe, vê mehê jî semîneran berdewam kir û di nava van semîneran de ya herî balkêş ji teref birêz **Mustafa Düzgün** ve, li ser dîroka nêzîwext ya Dêrsimê hate dayin bû. Semînerê, saet li 14.30 an dest pê kir heya derengî şevê, saet 17.30 û domand. Bi danasîna semînerdar ji teref **Derwêş M. Ferho** axaftinê dest pê kir û got ku: 'Em Kurd dîroka derî xwe, yanî cîhanê teva nas dikin, mixabin dîroka xwe û bi teybîf serhildanêñ xwe bi dorferehî û şoreşa xwe nas nakin.' Birêz **M. Düzgün** jî bi spasiya Enstituyê ku bala xwe daye ser karê rewşenbîrî û çanda Kurdish û mecal çêdike ku di derheqa karûbarê pisporî de gav bêne avêtin, bi vê pêwanê jî têkiliya me û komên xelkê çêdibe. Piştre gotin anî ser hovîtî û barbariya dewleta Tirk û mînakêñ qirkirina Kurdish, yên doh û iro bi giştî li Kurdistanê û taybetî li Dêrsimê. Diyar kir ku 'Pêwist e em Kurd dersêñ mezin ji van mînakân bigirin.' **M. Düzgün** mînak li ser malbata xwe jî da û got: 'Di wê qirkirina Dêrsimê de sê birayêñ min şehîd ketine. Ez jî li sergomê hatime Cîhanê. Navê min jî yê birayêñ min i mezin e.' Ú bi krokiyêñ herema Dêrsimê jî hêrîş û dorpêçana leşkerê Tirkân li herema Dêrsimê danışan kir. Wilo da diyar kirin ku berê, herema Dêrsimê bi bandor û tixûbê xwe ve ferehtir ji iro bû. Ku ci dewleta Osmanî, ci dewleta Tirk, weke her warê Kurdistanê, kesên zalim, xedar û li Kurdish bi kîn şandine Dêrsimê. Mînaka Biyikli Mehmed Paşa anî ziman û got ku: 'Iro jî serekhêz û serdarêñ herî zalim li Dêrsimê û her hêlîn Kurdishanê şoreşger û welatparêzan dikujin, gundan wêran dikin, komên xelkê pêwistî koçberiyê dikin.' Pişti van ragihandinan jî, Birêz **Mustafa Düzgün** li ser dîroka kevnar rawestiya, peymana di navbera Şêx İdrîsî Bîdlîsî û Yavuz Sultan Selîm kire dabaşa mijara xwe û bal kişande ser

doza 'kizilbaşiyê' ku îdeolojiyek pirr xerab û çewt ku têr nakokî û fesadî ye, heya iro jî di nava komên Kurdish de rolek mezin dileyize. Got ku: 'Dijminên Kurdish her dem bi navê İslamiyetê wêranî, talanî û kuştin kirine.' Di vê navberê de gotin hat û li ser xîlafeta Osmaniyan rawestiya û diyar bû ku 'kizilbaş'î dijî xilafetê bû û ev sedem jî li hesabê Osmaniyan ne dihat. Car din hate zanîn ku nakokî û fesadiya dijmin her çiqasî dijwar be jî, komên xelkê Kurd pêwîstî koçberiyê bûbin jî û bi vê koçberiyê re pêwsitî mezheb guhertinê bûbin jî xwe ji Kurdiya xwe dûr nekirine û li ser ax û cih û warê xwe bi serfirazî jiyana xwe berdewam kirine. Herwiha **M. Düzgün** gotin anî ser di dîrokê de serhildanê Dêrsimê û ji sala 1830 û vir de heya 1937 an 10 heb hejmartin. Got ku: 'Ji sala 1897 û vir de li Dêrsimê neteweyiya Kurdî dest pê kiriye heya iro jî berdewam dike. Osmaniyan xwest bi rêya medreseyen Neqşebendîyan ku li Dêrsimê ava kirin wan dûrî dozê bikin, bixin bin bandora ramanêñ xwe de, lê di sedsala 20 an de Kurdayetî di nava Dêrsimê de bingeh stend.' Bilî van teva birêz **Mustafa Düzgün** mînakêñ şêrgeliya Şahan û Alîşer û Zarîfe anîne ziman û got ku: 'Şahan stûna dêrsimê bû, Alîşer jî dilê Dêrsimê bû.' Lê, bi wesîfîdanek mezin dabaşa jina Alîşer Zarîfe jî anî ziman û got ku: 'Saziya jinan ji teref Zarîfe ve hate damezrandin. Ne bes ev bi tenê, Zarîfe mîna şêrê mîrê xwe jî di şeran de jêhâtî bû.' Birêz **M. Düzgün** bi milkulî gotin anî ser xiyaneta di nava Kurdish de û got ku: '26 ê Gelawêjê sala 1937 an ji teref casusê Tirkân ku Kurd in, Şahan di 27 saliya xwe de hate kuştin. 9 Temmuzê sala 1937 an jî Elîşer û jina wî Zarîfe têne kuştin. Berî Zarîfe Elîşer tê kuştin, Zarîfe dest bi dest heyfa wî dihilîme, lê ew jî ji teref xayinê din ve tê kuştin. Elîşer û Zarîfe li Dêrsimê mîna ewliya têne nas kirin. Seyit Riza jî, 10 Elûnê li ser pira Elîbeg bi tesadûfî tê girtin. Hun xweş bizanibin ku Dêrsim ne ji teref leşkerê Tirkân ve hate saff kirin, ji teref xayin û istîxbarata wan yê Kurd saff bû.'

## EV JÎ GIRÊKEK DIN E

*Kerîm M. BAQISTANÎ*

Mebesta vê kurtenivîsê ne vekirina dergehêن raman û felsefê ye û ne kûrçûna di derya zanistiyê de ye. Lê, ji ber ku ev mijar berkêlek na be. Mebest di pêvejoka çandî ya îroyîn de, xwe li ber çavan diyar dike ku babeta felsefi bi awayên lêkolîn nîne. Herwekî ev çanda neteweyî, xizana gotar û statikên vê mijarê ne.

Belkî di vê derheqê de, hinek deng bilind bibin ku ev çende ji ne pêwistiyêن realîta çanda Kurdî ye, ji ber ku ev babetekî rût e û teoriyek rût û tisi ye. Ev baweriya ku heye, *Jon Kolir* rastiya wê tune û bintar dike, bi taybetî di felsefîn rojhilate de. Herwekî pirsgirêka me di vê çarçewê de na raweste. Bîr û baweriyan cure cure her dem peyda dibin, lê tevgera çandî di naverok û rîmta xwe de ji merêja dîrokiyê ya ku di dervê bandora dagirkîriyê de werar û pêşve ne çû, ji aliyê din ve *Farington* rastiyek mezin tîne ziman di derheqek dîrokî de ku ramanyar, ger ji rojava tê der dibe feylesof û ger di rojhilate de derbikeve dibe pêxember. Lewra aloziyêن çandî pevgirêdayine di encamên xwe de: 'Di dîroka rojhilate de ramanyar û ronekbîrén Kurd pxemberiya miftîbeleş ji gelên dîtir re kirine.' 'Pêxemberiya çandî di demêñ îroyîn de kêm xweda ye, qels ziman e, pirr pêrewe û kopiyek lawa ze.' 'Encama girîngitîrîn ew e ku li hemberî durf û sîmya vê sedsalê gelo em dikarin çanda xwe biafirînin?'

Êdî felsefe nema dayika ramana çandî, ramana felsefi ji piştî ku ronesansa Ewropî bi cih û war kir paşve kişiya li hember êrîşa makînan û burxan û zimanêñ kompîtur. Gelo em dikarin prensîbêñ sotandina qonaxan pêk bînin. An ji hola rewşenbîrî (derveyî qutik û kirasêñ polîtîk) divê bibe xebatgehek karxaneyek kolektîv di xwepirsiyari û disiplîna komelgeha mêsêñ hingiv bo biserxistina *utopya* çandî.

## DESTANÊN KURDÎ

*Zozan OZMANIAN*

Di hinek lêkolînan de di derheqa janrêñ eposêñ rojhilate de destanan ser du beşan par dîkin - Yê xudaniyê (avtoryê), ku ji pirtûkan derbasî nav gel, nav folklorê bûne, û yên gelerî, ku ser binaxa dîrokê, çîrok û evînatîyê hatine sewrandin.

Bi baweriya hinek zanyara destan ji edebiyata klasîk derbasî nav civaka nexwendî bûne, (aşiq) û dengbêjan ew ji edebiyata gelê xwe, yan ji ji edebiyatên gelên hevsî hildane û paşê folklorbûna bi zimanê dê pêk hatiye. Lê berhemê Ehmedê Xanî, "Mem û Zîn", Xarîs Bitlîsî "Leylê û Mecnûn", Feqiyê Teyran "Şêx Senan", Mele Batê "Zembîlfiroş", Murad Xan Bayazîdî

"Zembîlfiroş" ji aliyê kurdnasan de bi yekdengî têñ hejmartin ser binaxa folklorê sewirandî. Lê eger em bîr bînin, wekî hozanêñ sedsalêñ navîn pirr caran bi xwe afirandinêñ xwe diqedandin usane divê em bipejîrînin, wekî çawan bandora folklorê ser afirandinêñ xwedantîyê hebûye, usan ji bandora afirandinêñ xwedantîyê ser folklorê hebûye. Pirseke bi giştî ne ronî kirî dimîne -peydebûna wan destanan ewêñ bal çend gelan hene. Bê goman, destanêñ di nav wan gelan de belav bûne, yên ku hevsiyêñ hevin, dinê dîtin û çandêñ wan nêzîkî hevin û bi hev re girêdayî ne.

Loma ji tiştekî metal mayînê nîne, wekî ew gel, li yek awayî nêzîkî pêkhatina giştî bûne, ya ku ji destanan re bûye binax û bingeh.

Di derheqa rêka mayîn de zanyara edebiyat û folklora Kurdî M. Rûdenko dinivîse: "Belavbûna naverokê li her deran, (gotin di derheqa destana 'Usiv û Zelîxe' de ne) yek bi kevnbûna wê , yek ji bi wê yekî tê mak kirin, wekî ji mêt ve ketiye nav kurdan. Hele di dewranêñ kevnar de Kurd, usan ji Ereb (bi destê wan)

bê goman bi tewratê re nas bûn. Ji baweriye ne dûr e, wekî hinek dîrok, di nav kurdan de dikarîbûn yanê raste-rast ji cihûya, yanê ji ji dewra destpêka misilmaniyê belav bûne.

Çawan tê xuyayê bi wê yekê dikare bê şirove kîrinê, wekî di şaxêñ kurdî de tiştêñ usa hene, ku di "Qur'anê" de tune ne (dema Usiv tayê mêzînê peya nabe, Usiv zinarê mermer dişkêne û tiştê mayin.)

Derheqa kevnbûna şaxêñ Kurdî de usa ji ew perçe dibêjin, ewin ji baweriya pütperestiyê têñ. Elementên batiniyê ku di destanêñ Kurdî yên mayîn de ji hene, di derheqa kevnbûna kokêñ wan de dibêjin. Hinek kîrin û serpêhatiyê nîgara bi destê hêzeke batinî têñ pêk hatin. Bo nimûne -hevdîtina Memê û Zînê. Pirr caran ew hêza batinî bi serê hespê diyar dibe. Di "Mem û Zînê" de Borê Memê hogir û şewirdarê wî ye. Koka vê yekê ji parastina hespê tê ku li ba pirr gelêñ rojhilata kevnar hebûye. Di pirr destanan de em usan ji rastî "moryê xewê", "ava avilheyat", "şîva quđretê" têñ. Yan ji nîgarêñ destanê, çawa Leyl û Mecnûn dibin stêr. Hinek caran di destanan de pêkhatinêñ dîrokî û detalêñ debê, rabûn, runiştandinê bi hevra ne.

Ji vê ji xwestin diyar dibe, bi wan détala dema sewirandina destanan bizanibin.

Ji bo diyar kirina dema sewirandina destana nîgar, personajêñ we dikarin alî me bikin. Carna di nav wan de kesêñ dîrokî ji hene. Lê divêt meriv ji bîra neke, wekî pirr caran di destanan de kesêñ dîrokî û pêkhatinêñ demêñ dû wan re bi hev re têñ hûnan.

Ev yek bi qanûnêñ sewirandina esirandinêñ épîkiyê tê şirove kîrinê. Lema ji di her peykarekî épîkiyê de qatêñ hin dewranêñ kevn, hin ji yên dewranêñ dû wan re hene.

Ji ber vê ji dewrana sewirandina destana tenê bi texmîn dikare bê diyar kîrinê.

## KOÇBERÎ Û WÊRANÎ

*Mistefa QESRÎ*

Di zarokiya xwe de, dema ku em dicûne newal, guher û girkîn demedoran, tim em liqasî kavilêner xerabcihan dibûn. Hingî me bîra wan xerabcihan ku demeke dirêj, kevin û mirovan ne dibir. Helbet hinek mirov di van kavilêner mezin de dijîn.

Qet ne dihate bîr me ku piştî koçberiya ji van cih û waran çîma kes li wan xwedî derneketiye û mane warê mişk û mar û dubîşkan. Lî, me di nava xwe de, bi wî aqilê zarokî her digot ku ev cih û warêni bi kevirêne nehîteyî hatine avakirin, di demjiyanê dûr û kûr de bûne warê bez û leyistikên zarokan.

Lewra jî leyistik û gerokên me di nava wan xirbihan de bûn. Ne bes ê me zarokan şivan û kahrwan jî ew der kiribûna warê civîn û bêhndanê.

Îro, tê digihijin ku ew cih û warêni di nava kevnariya salan de têkçûne, helbet di demjiyanê berê de warê evîndariyê û jiyana têr qerqesûn bûn. Sedema têkçûna wan çibe, nîşanî û mînakêñ baş in ji bo îro. Kurdistan îro jî têk diçe û bi derfîhatiyek pîr mezin vala dibe.

Ne hindik sê hezar gund vala bû ne.

Li gorî iştatîstek xwedest ku bikevê hejmara de, gundê herî biçûk 70 mal e.

Her malekê ji hindikayî ve 6 nefş in.

Hejmara malan derdikevê 210 hezaran ya mirovan jî derdikevê milyonan...

Helbet kêm zêdebûna gundan û

malbatan (bi kesan) heye.

Gundê ku hejmara wan 3 hezar in û teva bû ne warê mişk û mar û dubîşkan, piştî du nîşan wê bibin xerabcihêñ demjiyanâ bûrî.

Mîna wan cihûwarêni di demjiyanâ zarokatiya me ku di nava kevir û hêtyêñ wê de dileyîstin.

Kokel jî namînin. Tevan wê bibin şikêr... Kokel hinekî lê şikêr, nabin cihê jiyânê. Lewra jî dibêjim pêwiste ku Kurd baş bifikirin û bo cih û warê xwe ku bi destêne dagirkeran wêran dibe, bi hêz û hêrs xwedî derbikevin.

Hemberî têkçûnê destêne xwe bidin hev û bibin yek. Navê xelasîyê yekîtiye ye.

## WEŞANDİNA PIRTÜKÊN KURDÎ LI SOWYETISTANA BERÊ

*Wezîrê EŞO*

Pirtûk, Alfabe Lazo (Hakob Xazariyan) rola xwe qenc leyist, di nava dereceya hilanîna nexwedîtiyê de ji nava Kurdên Ermenistanê, lê wisa jî ew bû Alfabe pêşin bo zarokêne Kurd, di dibîstanê gundêne Kurdan de. Ji ber u ew alfabe bi tîpêne Ermenî hatibû hazirkirinê, lewra jî nebû bingeha weşandina pirtûkêne Kurdî li Ermenistanê û li komarêne Sowyetistanê yê dinê ku Kurd li kuderê diman. Sedem ev bû ku tîpêne Ermenî têra dengêne kurdî nedikirin: Lîkolîn û lîgerînê, bo amadekirina alfabe kurdî ser bingeha tîpêne latînî berî Lazo hatibûn pêkanîn: Bi hêvîkirina karkerekî Kurdan yê neteweyî ku bi navûdeng bû û navê wî Ebdurrezaq e û ji malbata Bedirxaniyan e, li ser çekirin û amadekirina alfabe kurdî bi tîpêne latînî dest da Hovsep Orbelî ku ew jî bi eslê xwe Ermenî ye û kar kir. Yê ku bingeha kurdzaniyê li Sowyetistana berêdanî. Lî çekirina alfabe kurdî ya bi tîpêne latînî merîvekî dinê ye, Ishak Morogulovî ji eslê xwe de Aşûrî mexîn, xilasiya salên 20 de pêk anî. Belê, xwedanê vê alfabe Morogulov bû. Lî Ereb Şemo di dereceya teşkîldariyê û bi xilasî imzakirina alfabe yê de alîkarî dayê de.

Sala 1929 an meha Adarê komîteya navendî ya temamiya Sowyetistana ya alfabe latînî ya nû bo Kurdên ku Yekîtiya Sowyetistana de dimînin, alfabe latînî ya nû ispat kir.

Alfabe ya nû bû bingeha pêşdebirina edebiyat û medeniyeta Kurdên Sowyetistana, xasma weşandina pirtûkêne Kurdî.

Alfabe I. Morogulov ya latînî, bû bingeha şoreşa edebiyatê û medeniyetê di nava Kurdên Sowyetistana de. Xasma yê Ermenistanê... Bi wê alfabe yê dest bi weşandina pirtûkêne kurdî yê politîkî û edebiyatê, yê edebiyata bedewiyê û dersdanê di dibîstanêne kurdî li Ermenistanê, li bajarê Êrîvanê bû. Pirtûkêne kurdî xasma yê dersan hatin weşandin. Wisa jî li Azebaycanê û Turkmenistanê... Rast e, serwerên

Azebaycanê, Kurdistan Sor pûç kirin, dane hilandinê, lê destpêka sala 1930 an heya 1937 an dest bi asîmîlekirina Kurdan ya bi destêne zorê ne kiribûn.

Pirtûka Kurdî ya bi tîpêne latînî ya pêşî li Êrîvanê sala 1929 an de bi sernîvîsara "Xu-Xu Hînbûna xwendina nîvîsara Kurmancî" hate weşandin. Ew Alfabe, bo merivêni bi temen mezin bû bo hilanna nexwendîtiyê. Xudanê wê Alfabe yê bû Ishak Morogulov û Ereb Şemo. Piştî, dîse wê salê li Êrîvanê Alfabe bo zarokêne şagirt, dibîstanâ bi avtorita I. Morogulov û Rûbêne Drampiyan bi sernîvîsara "Zimanê Kurmancî" hate weşandinê. Piştî sala 1929 an hejmara pirtûkêne Kurdî sal bi sal zêde bû: Eynî mîna lihev zêdebûna raziya piştî baranêne biharê û havînêra.

(dom dike)

*Lebûrîn: Hejmara bûrî di nîvîsara Birêz Mazhar Gunbat de, ji sedema teknîkî hevoka dawî hatibû qutkirin û wilo nîvrê derketibû. Em lêbûrîn û bexîşandina xwe jî xwendevan û nîvîskarêne xwe dixazin. Rastiya wê. Bi kurî, eger rojnamegerî bûbe xwedî hêzeke wisa mezin, hinek jî bi saya pêkanîna van xeml û taybetiyêne meslekî ne.*

## HÊLA RÛDÊNA ARASÊ YA DIN: KURDÊN QEFAQAZÊ

**Mehmet AKTAS**

Di zarokatiya me de Êrivan, bajarê ronîşankê bû. Ji bo zarokên Agirî dûr û warê negihandinê bû. Ji Arasê wê de, me goman dikir ku stêrikên Cîhanê teva li vî bajarî gihane hevûdin. Li Arasê, gelo çîma her dem dûrketin hebû? Me nizanîbû û tê nedigihiştin. Piştî rojêñ koçberiyê, bi jêr de ku em ber bi şaristanê bi ronîşank de diçûn, bê rawestandin ew çûkêñ Elegêzê berhimbêz dikirin. Hinekan ji me digot ez, bi wan re diaxivim. Me jî carcaran bawer dikir. Di van şevêñ Zivistanî yên dirêj de ji rihsipiyêñ kal û bapîrêñ xwe çîrok û çîvanok û serpêhatiyêñ xela û celayê, şer û cengê, rev û bazdanê guhdarî dikir. Kal û bapîrêñ me her digotin li wê hela din ya Arasê pis û pismamêñ me hene. Bi gotinêñ xwe re digirîn. Me, di çîrok û çîvanok û serpêhatî û evîn û nevînêñ xaltîk, metik, ap û xalêñ xwe yên hêla din, dengêñ nalêñ û axîna mirinê dikir. Ew kilam û stranêñ ku di deng û awaza dengbêjêñ dora Agirî ku bi wîlîna bilûra şivanan re govend digirt ji Elegezê dest pê dikir, li Agirî di nava kavîl û şikêrêñ dîrokî de pelax dibû. Ev çiya, her û her bû ne bav û bira, em jî wan wîlo dinasin. Piştî gelek salan, dema wan rojêñ ku radyo dest bi weşanê kir, cara yekemîn ku Casimê Celîl got: ‘Gelî guhdarêñ ezîz, Radyo ya Yêrewan xeber dide.’ Me dengê wan bihist. Xelîl û Evdal, Şeroyê Biro, Garabêtê Xaço, Seyadê Şemo, Zadîna Şakir, Eslîka Qadir û hwd. dengê bi dehan dengbêjêñ Qefqazê, çîrok û çîvanok û serpêhatiyêñ pis û pismamêñ xwe bihist. Bê rawestandin û bê zexelî, bi salan dengbêjêñ Elegezê, Telînê, Tiflisê, Aboyan bi deng û awazêñ xwe yên têr axîn û evîn, bi hesreta têr kulîn lorandin. Çiyayêñ me, deşt û newalêñ me, kul û merezêñ me, ew qedera ku bidestêñ bextreşan hatî nivîsandin welandin. Lê, mixabin me, yek carê jî dengê xwe ne gihande wan. Bes bi salan ku me dengê ‘Yêrewan xeber dide’ dikir, li welatê xwe yên têr qedexe, em dibezîne ber radyoyan.

**EM TEVA BÎ YEK XEWNÊ RAZA NE**

Dema ku dewleta Tirkiyê hate damezrandin, êdî ava Arasê bû xet û kete navbera me de, ew deşta sînxalî bûhû du şiq. Piştî 76 an, dema ku Sowyetistanê tertûbela bû, rê vebûn, em jî ber bi pis û pismamêñ xwe bezîn. Me ew dîtin û me hevûdin nas kir. Em hatin ba hev û bû ne mîvanê hev. Bi hesreta sed salan me civata xwe gerand. Bîranîn û serpêhatiyêñ xwe anîne ziman. Em tê gihiştin ku di eynî dem û rojan de, bi xewnêñ weke hevûdin em razane û me xewnêñ weke hev dîtine. Û di nava yek xeyalê dûr û kûr de mijul bû ne. Niha, piştî ji hev dûrketina sed salî, em hevûdin berhimbêz dikin. Piştî pirsalan, weke dem û dewranêñ berê, bi cîrantî, dost û yarı, pis û pismametî... Em car din bi hevûdin re ne... Cefoyê Evdal, ji Êrivanê çû welatê xwe û li Botanê şehîd ketiye. Kurdêñ Cizîra Botan ji bo Kurdêñ Elegezê xwepêşendanek birêziyê lidar xistin. Berî ku Keremê Angosî nas bikim, min li Stembolê, ji grubek muzîkê yên Kurd strana ‘sîpan’ guhdarî kiribû. Ev stran kurtedîroka Kurdêñ Qefqazê û hesreta wan ya welat û hezar salî bû. ‘Ka here erda Wanê/Bibîne çiyayê Sîpanê...’ Ev her du rêzik bi rojan di nava kolan û çaryanêñ Stembolê, di devê min de bû ne û gotin û liviyan. Yê ku helbetsa Sîpan nivîsî, endamê komîta navêndê ya Partiya Komunista Gürçistanê, yê kevin û berpirsiyarê radyoya Tiflisê besê Kurdi, Keremê Angosî, ji Kurdêñ Ezdahî ku ji dora çiyayê Suphanê sergomî van deran bû ne û navê wî çiyayî pîroz ku dayî ye pirr cih û gundan e. Di bêje: ‘Me navê cih û warê bav û kalêñ xwe ku li hêla din ya sînor mane, di vî cih û warê ku em lê cîwar bû ne.’ Û dibêje: ‘Min sîruş û sawîra xwe ji wira stendiye û helbesta ‘sîpan’ nivîsandiye.’ Kêlika ku ez, ji Tiflisê li trênenê suwar bûm û ber bi bajarê ronîşankî yên zarokatiya xwe çûm, min Bedir nas kir. Gote min: ‘Qet ne çû me hêla din ya sînor, lê ez dikarim, ji hember ve, navê wan gund û çiyan û mesîl û newalan teva bibêjim.’ Û yek bi yek dibêje jî.. Bedir: ‘Bavê min heyâ roja ku wî mirê jî, bê rawestandin dihate serê mitikekî hemberî çiyayê Agirî û bi saetan li bilûrê dida. Carcaran ez jî bi xwe re dibirim, navê cih û waran ji dûr ve digote min, behsa pis û pismamêñ me, dost û kirîvîn me yên wê derê dikir.’ Piştî çend rojan, li quntara çiyayê Elegêzê, jineke Kurd bi navê Tazegul, ku piştigiriya wê muhendisî bû di derheqa Bedir de wiha gote min: ‘Her Kurdê ku li van deran dijî, dema bi bangê re çavêñ xwe diveke, pêşî çiyayê Agirî ku li hêla din ya sînor de ye dibîne. Li heybeta wê dinêre. Em teva siha wî li ser xwe dibînin. Ev, sebeke ji bo me...’ Êrivan êdî ne ew bajarê ronîşankî ye. Ermenîstan azad bû ye, lê weke ku dem berepaş de vege riya ye. Ronahiya bajêr bi find û fanosan pêk tê. Elektrîk di hinek rojan de û du caran heye. Ew bajarê xewnêñ zarokatiya me, mîna delalek pîrejin, ku xîreta wê ketibê nava lingan û silûk şikestî be lê hatiye. Êvarek hînik ya bîharî... Li Êrivanê gundekî biçûk, li ber ronahiya findekê, guhdariya şefê KGB yê kevin û Serokwezîrê Kurdistana Sor, Wekîl Mistefa dikin. Berî dest bi çîroka daxûyankirina fermî ya Komara Kurdi, me li hal û kêfxweşîya hevûdin pirsî. Bê rawestandin hêla din ya sînor dipirsî û dabaş dianî ser eşîra Birûkî... Dema ku kesen dipirsin û min nas dikirin pirr pirr kîfa wî dihat. Mîna Êrivanê, wî jî hêz û delaliya xwe ya berê winda kiribû. Ev kulek bê derman bû û ketibû ser dilê wî de... Lê ew xewna wî, weke her mirovê têr hêvî û xwedî hêza berxwedana jiyanê bi daxwazek mezin û geş dagirtî bû. Di got: ‘Kurdistana Sor wê bibe xasbexçeya Kurdistana mezin.’ Lê, vê gotina min dilê wî şikand. ‘Ermenî, bi finasî Kurdan bi kar anîn?’ Lê, ne da der. Piştî ji hev de ketina Sowyetistanê weke her karbendê KGB wî jî pirraniya hebûna malûmewdanê xwe di tekoşîn û berxwedana Kurdistana Sor de da ye. Ev pêkanîn tucaran ne dianî ziman û ne dikire dabaşa galgalâ xwe. Hê jî, ji bo xeyal û hêviyêñ xwe berdewam dike. Bi wan gotinêñ ku berî niha min ji devê kal û pîremêren gundî bihîstibûn û di bîra min de mabûn diaxivî. Bi saya Xwedê eşîr û êl teva wê bibin yek... Pêşî emê birayêñ xwe ku li çolîstana navenda Asya bela bûnîn Kurdistana Qefqazê û piş re wan bigihînîn Serhedê...’ Wekîl Mistefa, dema dawiya wotka ku danîbû navbera min û xwe xelas kir, çîroka trajediya malbata xwe ya ku bi destê Stalîn, ji Azerbaycanê sergomî Kazakistanê kirin û çîroka pismamê xwe yên li Wanê jî xelas kiribû. Dabaşa me ya li ser Kurdistana sor jî mabû roja din. Ji sedema pevçûn û şerê navbera Ermenî û Azeriyan, welat vala bûbû. Serokwezîrê Komara Kurdi, ku mabû bê mirov, dema kete nava livînan de, bi dilekî şikestî: ‘heger rojekê ez biçim Wanê, dikarim bê pirsiyarî û rîber gundê bavê xwe bibînim û nas bikim.’ ‘Ji pirtûka WERE DENGÊ MÎN’ ku wê nêzîk bê weşandin hatiye stendin.’